



Gelo Rewşenbîrên Me Li Kîvene?



Dr. Nemtulla Hamd Nihêfî

1

Herêma Kurdistanê piştî rizgarkirina Îraqê û pişkdarbûna Kurdan di avakirina Îraqa nû da ketîye hemberî gelek sernîşîvî û serevrazîyan. gelek mafên Kurdistanîyan di destûrê nû yê Îraqê da hatîne binecîhkirin, lê arîşa Kurdan herdem ew bûye ko destûr û yasayên diqazanca Kurdan da

hatîne nivîsîn nahêne bicihînan. eve deh sal burîn û Kurd hêşta yê bi ji vanê firwyê gay. anko dişêyn bêjîn eqîyeta serkirdên rujhelatî herdem beref xwe sepandin û bin pêkirina mafên yên dî ve ya arastekirîye. eha li vêrê erkê rewşenbîr û ragehindkarên Kurd dîyardibît hember vedîtina rêke çareyan bo qeyranên heyî û hoşiyarkirina cemawerê Kurdistanî liser metirsîya pêşhatên nû.

2

Îraqa berî daeş Îraqek bû ko serkirdên wê hevdû qebûl nedikir û berdewam girê û asteng dêxistine dirêya hevdû da. serkirdên wê berdewam hevdû bçûk dikir û li dwîv berijewendên xwe yên berteng digerîyan. qedera Kurdan jî ewbûye ko werîsî li dwîv ewan rwîdanan berden pêxemet hîvîyekê ko madeyê (140) bicih bihêt û deverên Kurdistanî yên dervey îdara herêmê veqerîne hembêza Kurdistana dayk. lê ruj bo rujê arîşe û têknegehiştin mezintir lê dihatin û qeyranên nû dihatine gurê. divan kaudanan da rwîdan libin kuntirula serkirdên Îraqî derketin û dengê nerazîbûnan bilindtir lê hat. Rewşenbîrên Kurd weku kesane pişkdard pêşhat û rwîdanan da, bûne çend alî! hindek ji wana bî



dengî helbijart û xwe dûrî evan serêşîyan kir. hindekan jî bi şêwekê nêgetîv vîaye ptir xwê biser birînê da ken û dengê azaran bilindtir lê biken bi wê hîvîyê ko tiştekan bi dest wan bikevît û bigehne damê. anku berjewendên wanên kesokî hizir û reftarên wan arastedikirin. helbet ev cure kese dizûrn û ta radeyekê şîyan şilqekê bêxine cemawerî û wan bo bidesveînana berjewendên xwe bikarbînin û wan bikene sutemenyê armancên xwe. helbet ev kese rewşenbîrên pare û mekseb perêsn û çî hîvîyek ji wan nahête çaverêkirin. hindek rewşenbîrên dîtir bi dilsozî gutarên xwe arastekirin bi wê hîvîyê ko alîyek hebît guhdana wan biket û sistemê birêvebirinê û ezmûna demukirasîya Kurdistanî bi rêka pêşniyar û pişkdariya wan beref pêş biçin û dewlemend bibin. lê mixabin ev cure kese dikêmbûn weko rêje û ewên guhdana wan jî diken jalîyê deshelatê ve dikêmbûun hemberî yên dî yên tepeserker. ha evan kaudanan wekir ko rewşenbîr bixwe jî bikevîte digumanê da û êdî hîvîyên rizgarbûnê ji qeyran û arîşan kêmbibin. kaudan bivî rengî berdewam bûn û arîşên me yên navxoyî çirtir lêhatin û deriza hevtêknegehiştinê dinavbera Hewlêr û Bexda jî kûrtir û frehtir lêhat. ta gehiştîye wî radey her

alîyek li gelîyekî jîya û guh li dengê alîyên dî nedibû. herçende hilbijartin hatine encamdan û cemawer bi rêjeyên zûr beref dengdanê çûn bi wê hîvîyê peyamekê bidene alîyên sîyasî ko li xwe bizivirin û guhdana îrade û dengê cemawerî biken. lê mixabin li welatên rujhelatî ewê kursîk girt zû bernadet û hemû tiştêkî dê kete sutemenîyê mana deshelata xwe. dencam da şilqeka mezin bi rwîdanan keft û Îraq beref ketin û parçebûnê ve çû.

3

Daeş peydabû, rwîdan bileztir lêhatin, Kurda deverên xwe rizgarkirin, Malikî li kerê belayê swarbû, cemawer beref şerê taîfî ve çû, destê alîyên derekî dikarubarên Îraqê da bisengtir lêhat...htd. lê divan hemû kaudanan da rewşenbîr jî berizebû. dengê wî ket û êdî wî bi xwe jî ageh ji dengê xwe nîne. gelo eger bipirsîn, rewşenbîr kîve çû? mêşkê wî mijûlî çîye? buçî pişkdarîya wî nedîyare? dibersivê da dê kevîne hember hindek peraduksan. û bi neçarî dê dibersivan da windabîn. erê Îraqê çend rewşenbîr hene? erê ta çi rade ew rewşenbîre bûyne êxsîrên zûr tiştan? erê eqlên Îraqî ceymîne? erê îrada kesatîyan nemaye û çavên

wan kûre bûyne? buçî rwîdanan nabînin û bi karîgerî pişkdarî çarekirinê nabin? ka ew kesên xwe bi qebe dizanin û qelemê xwe bi rizgarker dizanin? jibilî evan pirsar, em dişeyn bêjîn kanê ew kes yê ko hizirê dinasname Îraqî da diket? eger ew kes nemabin? gelo boçî em xwe û cemawerî dixapînîn bi tişteki ko çî hebûn bo nemaye? Îraq evro bûye xwedî gelek nasnameyan. nasname Kurdistanî, Suninî, Şîî, Mesîhî, Turkmanî...htd. helbet rewşenbîr jî bi heman şewene. ev alîye hemûjî muzayeda liser hevdu diken û bo gehîştina meramên xwe diruoşmên qebe û tubawî vedigêrin. li vîre bi rastî kenîya miruvî bi alî û ehzabên Îraqî dihêt. û ya seyr tir jî kenîya min bi rewşenbîrên Îraqî dihêt. limin negirin çunkî eger hûn jî hizir direwşenbirên Îraqî da biken dê mirin ji kenîya da û dê dihebûna hevdişîyên wanda berizebin.

4

Bila em xwe û yê dî nexapînîn û bi dengê bilind bêjîn rewşenbîr li Îraqê nemayne û hemû yê bûyne dîvelank û peyam derên hêzê, evca çî hêza sîyasî, abûrî, mezhebî, eşîretgerî...htd bît. Îraq evro papureka ji kar keftîye û li nêzîk dê helweşyê û bîte sê pirt. ewên li vê papurê jî sîyar



yê bizavê diken derizên wê kûrtir û xurttir lêbiket. di encam da dê mizgînîya nemana Îraqê zû gehîte guhên me û rewşenbîrên mejî yê li ji vanê dengê şkestina papurê, da her êk cihê xwe diparçeka papurê da biket, xwe bi deskeftan ve bigirît. Îraq û rewşenbîrên Îraqî yê disekeratê da û çavê hemîya yê li xwandina fatîhê. lê alîyên dî jibilî Kurdistan dtirsîayne û newêrin û nevîaye zenga mirna laşê Îraqa hermî ji wan peyda bibît, eger ne, hemû hezdiken û li pişt perda yê kar jibo wê yekê diken. Li dumahîyê dişem bêjim qeyran yê rewşenbîran birêve diben û ew neşîayne wan qeyranan birêvebiben û berf çareyîyan araste biken. Eve jî wê rastîyê digehînît ko rewşenbîr jî dipişkdarin didirustkirina van qeyranan da û wan diberjewna xweda dibînin. eger ne, neya beraqle ko ev hemû rewşenbîrên xwe bi rewşenbîr dizanin di Îraqê da husa bûyne derizîkên bêhoşkirina cemawerî bo meramên nizimtir ji navê xwe. gelo rol û senga rewşenbîrên me yên Kurdistanî divan kaudanan da dihête dîtin? gelo rewşenbîrên Kurdistanî xwe êk la kirîye dipirsa dewletbûnê da? gelo ew ji rewşenbîrên Îraqî dicudatirin hember pirsê Îraqçiyetîyê û Kurdistanîbûnê da? hûn dişên bersivan biden û babetî bi dumahî bînin.